

# Bernameya hilbijartina me wê zûtirkê bigihêje

24`ê Îlonê roja Hilbijartina Parlamana Neteweyiya Almanayê ye. Ev parlamana jibo karên welêt biryarê dide. Hinek dibêjin ku hilbijartin pêk hatiye. Rast e: Li bara "Hiç" biryar hatiye dayîn. Ji niha û pê va çarenivîsa welêt girêdayî bi qasa hêza Çepgirana e. Girêdayî bi dengê we ye!

Edaleta Civakî, Ewlehiya Civakî, Aştî û Kêmkirina Çekan. Em bi vê armançê tên meydanê û pêbaweriyê me bi wê yekê heye. Em qebûl nakin ku zarok di rebentî û belengaziyê da mezin bibin; Li halê ku hejmara mîliyoner û milyarderan ber bi zêdebûnê va ye. Em qebûl nakin ku destmîzîd û meaşa kesên malnişîn û jikarketî têra jiyaneke bi serfirazî neke, ewelhiya kar û pêşeyê tunebe û pîrriya xelkê tîrsa wan ji pêşerojê hene. Em qebûl nakin ku hema bêje li her derê lawaziya malî û belengazî hebe, lê halê ku xercên bikarhatî jibo şêr û çekan duberaneber bûye.

Gellek ji mirovan ji van siyasetan êdî têr bûne. Gellek kes daxwaza guhertin, Edaleta Civakî û pêşerojê ewlehiya jibo xwe dikin. Gotina me ev e: Nabe û nemumkin e ku rewşa welêt wisa ku niha heye, bimîne. Bihêlin ku em bi alîkariya hevdu tiştêkî biguherînin. Em dixwazin welêt biguherînin: Bo welatekî civakîtir û edlanetir!

Tevayê partiyên din amade ne ku siyasetên salên dawî bidomînin. Tevahiya wan wek partiyên hevpeymanî serokwezîrê hatine meydanê. Lê em Na! Em daxwaza guhertineke rasteqîn a siyasî û welatekî civakîtir dikin. Eger çepgir bi desthilat bibin, wê hin guhertinan pêk bînin. Ev hêvî di roja 24`ê Îlonê da dikare were bijartin! Jibo pêkanîna guhertineke civakî û sekinîna li hemberî dewama siyaseta îro: Dengê xwe bidin Partiya Çepgirana.

Armanç û bernamêyên me diyar, edlane û li gorî hesabê ne. Em daxwaza welatekî dikin ku têda ewlehiya kar û şolê hebe û em bikarin jibo pêşeroja xwe planan darijînin. Em daxwaza welatekî dikin ku têda tîrsa tu kesî ji belengaziyê tunebe.

Em daxwaza civakeke yekgirtî û yekparçe dikin da ku tu sinor û berbedek jibo tu kesî tunebe. Em jibo berevaniya ji beşdariya giştî û bîbandor a hemî kesên astengdra tên meydanê. Yekparçetiya civakî mafekî mirovî ye. Em dixwazin ku berben-dan ji ser rê rakin û jibo kesên astengdar û kêmendam zemîneya jiyaneke serbixwe û bêyî girêdayîbûnê amade bikin.

Em ê bi pêkanîna ewlehiya civakî û zêdekirina meaşa kesên malnişîn û jikarketî toreke bihêz ava

CIVAK.  
EDALET.  
AŞTÎ.  
JÛBO GIŞTAN.

**Pêşerojê de ji bo ku em bi xurtî dixebite**

**DIE LINKE.**

bikin. Tu tîrsa me tune ji viya ku em bac û xeraceke girantir ji mîliyoner û milyarderan bistînin. Em daxwaza welatekî dikin ku têda mal û heyitî para giştan be.

**1. Serfirazî û şola baş.** Çepgir li kêleka kesên bi kar û şol disekinin da ku serfirazî û şola guncaw û munasib bibe para wan. Em daxwaza ewlehiya kar û şolê û destheqa zêdetir dikin. Bi vî awayî meriv dikare jibo jiyaneke bernamêyên xwe darêjîne. Destheqa herîkêm li berdêla her demjimêra xebatê divê heta 12 Euroyî zêdetir bibe. Tenê di rewşeke viha da ye ku kesên bi kar û şol dikarin li ser belengaziya heyama malnişînbûnê hesta dilgiraniyê nekin. Em dixwazin ku bihayê biryarnamêyên dayîna destheqê û Yekîtîyên Karkeriyê zêde bikin.

**2. Kar û xebatê divê jibo dabînkirina debara jiyaneke be, ne ku jiyana jibo xebatê.** Em karên demkî û neçê bikaranîna biryarnamêyên karkeriyê bi dawî tînin. Dewsa şolên biçûk û nîvwext ên bi neçarî, em ê atmosferên karî yê guncaw pêk tînin ku hertimî bin û li ser esasa tarifên pesendkirî yê qanûnî, destheqê didin. Li şolên hevsnan û hevsewng, divê ku destheqa mêran û jinan branber be. Kesên ku mijûlî şolên civakî ne, divê bi awayê diyarkirî destheqeke baştir werbigirin. Em dixwazin ku dewsa karên demdirêj, têra xwe wextê jibo bêhnvedan, malbat, aramî û betlaneya xwe Texan bikin!

### 3. Em naxwazin ku tirs a me ji heyama

**malnişînbûnê hebe.** Meaş malnişînbûnê divê tîra jiyaneke standard di vê temenê da bike. Bi vê mebestê em dixwazin ku esas û asta meaş malnişînbûnê heta ji sedî 53<sup>ê</sup> zêde bikin. Kesên ku li berdêla demjimêrên xebatê meaş û destheqeke kêm tir werdigirin, di heyama malnişînbûnê wê destheqeke zêdetir jibo wan bê terxankirin. Bi vê wateyê ku wek mînak bifiroşeke jin di heyama malnişînbûnê da 270 Euroyî zêdetir werbigire. Em dixwazin destheqa herikêma malnişîniyê bigihînin asta hevaheng a 1050 Euroyî di mehê da. Qasa destheqê meaş malnişînbûnê li rojhilat hema wisa kêm tir ji rojavaya welêt e. Em ê wê yekê yeksan û beranber bikin.

4. Sîstîma Hartz-IV<sup>ê</sup> (Mebest sîstîma wergirtina komîsiyonê ji karên nûjen e) gellek kes belengaz û reben kirine. **Em ê dewsa wê sîstîmê**

#### **Bernameya Dabînkirina Herîkêma bêyî**

**Boykotê daynin!** Em ê hin çalakîyan bi hev ra bikin yek ku berî niha bi awayê cida û serbixwe diviyabû pêk bîn. Destmizda bêkarbûn û bêşolîyê divê jibo heyameke dirêjtir bê dayîn. Nabe kesek di mehê da kêm tir ji 1050 Euroyî jibo derbaskirina jiyana xwe werbigire. Em ê jibo xercên elektrîk, veguehstina giştî ya nav bajêr û Mêtroya Bajarî (Deutsche Bahn) tarifên civakî berçav bigirin. Em derdem alîkariya xerciya jibo zarokan heta asta 328 Euroyî zêdetir bikin û dûra plana dabînkirina hewcetiyan bigehînin ên zarokan cih bînin.

**5. Bac û xeraca edlane!** Jibo heytî û derhatên zêde – Zêde ji yek milyoni – serê axir plana bac û xeraca li ser derhatê dê cih were. Bi vî awayî em dikarin xizmetên giştî zêdetir raber bikin: Dibistan û Baxçeyên Zarokan, avakirina malên Civakî, Întirnet, Nexweşxaneyên wêsayitên veguehstina gelemperî. Bi vî awayî dê sûd bigihêje giştan. Dema ku giştan par û pişka xwe hebe, jibo giştan bi awayekî munasib sedemên rehetî û tebatê tîna dabînkirin.

#### **6. Em ê bac û xeracê jibo kesên ku derhata wan kêma navgîn e kêma bikin.**

Em ê asta Miafbûna ji bac û xeracê heta 12600 Euroyî zêdetir bikin. Bi plana me ya bac û xeracê hemû kesên ku derhata nexalîs a wan 7100 Euroyî di mehê da ye, wê ji dayîna bac û xeracê bêna miafkirin. Bi zêdebûna bac û xeraca li ser derhatên zêde, em ê vê reqemê hevseng bikin.

#### **7. Êdî wê dermanên Pileya Duyem tunebin:**

Dewsa çaverêbûna dirêjdem û hatûçûna zêde, em ê plana dabînkirina saxlemiyê jibo giştan cih bînin. Dema ku hemû beşdariya li vê planê bikin, wê xerc bikarin bêna dayîn: Li plana dabînkirina saxlemiya giştî, tevayê gel diravekî didin û li berdêla wê, gişt bi awayê beranber û munasib tîna dabînkirin û em ê xercan heta ji sedî 12<sup>ê</sup> kêma bikin. Nabe ku kesek jibo kirrîna berçavkê an danîna diranên

çêkirî xerace Zêde bide. Kompanî û kedkar diravekî beranber didin. Em ê 100000 perestaran (hemşîre), ji jin û mêran bînin ser kar: Ev plan dê li ser xêra kesên xwedîkar û nexweşan be. Em ê li hemberî her nexweşxaneyekê ku bixwaze betal bike an veguheze beşa sivil (Ne-Dewletî) bisekinin!

#### **8. Em ê li ser guncawbûna kirêmalê kar bikin.**

Li gellek ji bajaran, bihayê kirêya malê hertim ber bi zêdebûnê va diçe û ji ber vîya hin kes neçar dimînin ku taxa xwe biterkinin. Em dixwazin li hemberî van cîbicîbûnan rawestin. Li taxên ku tûşî jor û jêrçûna bihayê kirêya malê ne, em ê bihayê kirêya malê neguhêrbaz ragirin an kêma bikin. Dê malên zêdetir digel sozên civakî bêna çêkirin; Zêde ji 250 hezar malî di salê da. Em ê ambarkirina kelûpelan li nav malê (bi hêviya ku ji joradûna bihayê wan sûdê bêna girtin) Qedexe bikin.

**9. Wêrekiya Guhertinê!** Em dixwazin bibin destpêkeke nû jibo Yekîtiya Ewropayê: Dewsa ku em ewlewiyet û mafê pêşînbûnê bidin kompanî û bankan, em dixwazin di qonaxa yekem da bala xwe bidin ser Mirovan. Armanca me ev e ku bernamayeke pratîkî jibo rawestana li hemberî bêkarbûnê li Ewropayê û jibo abora civakî û jîngehî cih bînin. Dewsa lihevkerinnameyên Ticareta Azad wekî TTIP û TISA<sup>ê</sup> ye, em hewcedara ticareteke edlane û sîstîma bibandor a parastina hewa û jîngehê ne. Em ê Yekîtiya Ewropayê bikin atmosfêreke Civakî, Dêmokratîk û Jiyanbar jibo giştan.

**10. Em pêbendê Aştiyê ne.** Partiya Çepgirana hertim bi awayekî ciddî li hemberî şêrr û zêdekirina çekan sekiniye. Em dixwazin ku leşkerên Almaniyê ji derveyî welêt bînin. Bernameya wê dewletê ev e ku du beranber diravê zêdetir bide artêşê. Me, dewsa zêdekirina çekan, dil heye wan kêma bikin. Em ê dewsa wê, dirêv jibo nûkirina dibistanan, avakirina Baxçeyên Zarokan û belaşkirina wan xerc bikin. Derfirotina çekan bi taybet li deverên biqeyran, şêrr gurr dîke û gellek ji xelkê neçar dibin ku birevin. Em dixwazin ku derfirtona çekan qedexe bikin.

*Partiya Çepgirana li rikeberiyên xwe yêna Hilbijartinê wek tenha partiya parlamani ya serbixwe ye ku girêdayî bi alîkariyên malî yêna kompanî û bankên mezin nîne. Ji kerema xwe bi alîkariya xwe ya malî, ji Partiya Çepgirana piştgiriyê bikin.*

IBAN DE38 1009 0000 5000 6000 00  
BIC BEVODEBB

Şifreyê: Wahlkampfspende  
an jî bike: [www.die-linke.de/spenden](http://www.die-linke.de/spenden)

Zanyariyên têkiliigirtinê: DIE LINKE  
Kleine Alexanderstraße 28, 10178 Berlin  
Telefonê: +49 30/24 00 99 99

Fax: +49 30/24 00 95 41

wahlquartier@die-linke.de, [www.die-linke.de](http://www.die-linke.de)

V.i.S.d.P. Matthias Höhn